

xwest perdê biçirînim û gotina ji pişt berdim, lewra min dest bi gotinê kir.

- Tu karî berdewam bikî, ew jî hevale.

Hîna min gotina xwe negîhandibû serî, herdu heval mîna dîkan rabûn hev. Xwîn... tîr.. hovîtî.. kef û kopik ji devan di herike.

- Çime tiştên ku di kongir de bûn tu ji hevalan re danaxî. Tu hatî bi laf û derewan heval bixapînî. Berpirsiyarê me dest bi êrîşê kir.

- Mîna çi, tu karî ji mere bêjî. Bi bêhneke fereh û kelî, wî hevalî vegerand. Berpirsiyar ji şewa axaftina wî hate kelandin û bi hêz got:

- Tu karî ji mere bidî xuyakirin, çime nehcê we duruste û yê me şaşê. Lê zû-zû ew ne axifî, dest avêt berîka xwe; Pakêt derxist û yek çixare ber me dirêjkin.

- Em û çixara ne dostin. Berpirsiyarê me got û dema dirêjî ber min kir, berpirsiyar bi çavekî perîşan û tirs li min nerî, lê wî hevalî çixareyek derxist û li pêş min danî û wilo ma, bê ku ez pêxim û hilmek kûr bikşînim.

- Hevalê delal, em kesin Polîtîkîne, em ne şervanin, ku her hevaleyê şaşiyek kir, em serê wî jêbikin.. tişt nebû.. Dema ku hevaleyê şaşîtiyekê bike, hêdî-hêdî, yek dikare wî hevalî... Berpirsiyarê me, bi dilekî tijî ol û hesta partîwerî, gotina wî birî.

- Çi nexeme û tişt nebû, ev vegeriye ji nehcê Partî û

tevgera şoreşî. Ma me tevan nexwendiyê ku movika rexnan ya tewrî girînge ku dihêle hertim partî li ser riya şa... ya rast bimîne.

- Belê me tevan xwend, lê me tevan bi hev re înzekir, ku gotinan li pişt hev ne bêjin. Eger me şaşîyek di cihekî de dît, divê em bihevre li ser rawestin. Berpirsiyar bi van gotinan kizirî, rabû ser xwe û qêrî.

- Kes nema û tu hatî ser tiştên şaş û rast bi peyivî. Tu li kûbûyî dema hevalên te xwe bi dijimin ve girêdan û destên xwe xistin yên... Lê ew heval jî rabû serxwe, û ketin xirnika hev.

- "şerî weşşa li nav garisî me bibe". Ev metelok hilpekî serê min. Min xwest, wan jî hev dûrbixim, lê di nav wan de cilên min qetiyên.

Di navbera çend û çend rojan de, hevalên berê mîna mêşên hunguv û sêmsoran li dû hev dizîvirîn. Her yekî dazana Partiya xwe ya "nû" kiriye dest xwe. Partiyek bi navê yên bi çixarê re, û partiyek dî bi navê yên dijî çixarê.

Ba xuşî, ewir dan ber xwe, ewrin reş... zer. Riwê zemîn bi tozê hat veşartin... şuştin û du kelem, ji yên bê-dirî, zikên axê qelaştin.

**Heleb - 1991**

## Baran

Çav bi pelê rojnamê dikevin, bi gavine mirî ber bi wê ve dimeşe û pelege din ji payîza temenê riswa diweşe û bi qulbandina wî pelî re, penda wê rojê dixwîne; "Bihuşt di bin nigên dayîkan de ye". Bê mirûz, çend caran dibin çavan re dibe û tîne mîna ku yek bixweze wêneyeke ne li bal binase û çend carine din, wê pendê û bêyî ku ew bighe tutiştî, dixwîne. Dengê sênîkê dihêle ku, pelê rojnamê di pençê de bişke û di xalîdanka mişt de, kom ser hev bibe.

Ro gihîştîye dev-devî nîvro, çend piyalên qehwê û nîv pakêtek şewitandibû, cixara dawiyê rovikên wî dişewitîne. Li ser masê dinêre ku, hîne sênîka hêkên duh li cihê xwe ye û ji her nanekî du parî weşîne. Dest davêje nanê hevala ku duh pê re bû û kûr bihin dike; Bihna biskên wê jê dihat û hevdeyeke porê wê jî li ber nanê wê ketî. Radihêje wê û tiliya xwe pê bi darve dike. Tiliya bi dardakirî li ber xwe dide û bi hejandina wê re, mûyê por diqete û dihêle hejmara tiliyên bi dardakirî zêde bibin.

Pariyeke nan dişkîne û hêka nîvşewitî dike nav. Radihêje çaydên, hîne dagirtî ye; duh ji bilî du piyalan jê danegirt û ew hîne weke xwe mabûn. Çend pariyên hêka nîvşewitî bi xêra qurtên çaya sar dadiqurtîne û dest davêje cixareyekê, xelekên dûmên mîna ewrine stewr di ezmanê odê de dimeşin.

Berve pencerê dimeşe, toz û pelên daran bi bayê payîzê re ketine cirîdê, her çendekî balîskek serî hildide, eger kesek di cadê de hebe, dihêle ew mîna mirîşkan seriyê xwe têxe bin milên xwe.

Hatina ewî kesî û sekinîna wî li aliyê din ji cadê, hemberî pencera wî, bala Diranê Pîrê dikşîne. Dîke di riwê wî dirame, ne ji yên dostê wî ye; bihna qehwê û pelên rojnameyan jê nayê û bi ser de jî, nirîna wî li çûn û hatina xelkê bê tirs e; bê şikandina çavan e.

Mirovê di cadê de sekiniye, her çendekî ber bi pencera wî dinêre. Diranê Pîrê tiştêkî nêzîkî berkeniyê di riwê wî de dibîne, bi dizî perdeya ku, carina li şûna destmala destan bi kar danî, berdide û di qurzîka qetiya re li wî dinêre; sola wî ya dibriqî çavên Dirên dikolin û cobarên qûmê jê diherikin. Di beyabaneke bê dawî de dimeşe, her diçe cobarên qûmê fireh dibin, nigên wî tê de diçin xwar û hilma germ bêvlan dikizirîne. Stêra ku xwe di ezmên de dişewtîne jî hejmara pinpinîkên kizirandî zêde dike.

Careke din di ber masê de rûdine, piyalên çaya mir-  
dar, rojnameyine kûnde, lekên zêtê û dilopên qehwê  
riwê cîhana wî nîgar dikin. Baran dereng mabû û xel-  
kên bajêr di nav pêlên tozê de difetisin, ewir dihatin û  
diçûn, ewrine stewir û dengê mele bi hatina ewran re  
tûj dibû, ew derdiketin seriyê minaran, girikên nav ba-  
jêr, ser sîng û memikên pîrekan û bang hildidan, lê ew-  
rên stewir tîrbûna tozê pirtir dikirin.

Welatên ku bi tozê hatine pêçan û sînorkirin.. Baran  
jê direve, seg radibin hev û pir zaro seriyên xwe di şerê  
wan de winda dikin, lîlandina dayîkên wan jî, pir  
çeman di tabûtên wan ên biçûk de derdikin.

Di welatê ku bi tozê hatiye pêçan- sînorkirin.. ji bilî  
mirîşkan kes avis nedibû; her diçû rengê daran zer dibû  
û zarok jî kal dibûn.

Kesên di bin de îro bi ser ketine, li jor - jor in. Ewê  
ku di rojekê de, li ser bû û pozê xwe bi wê yekê bilind  
dikir, ketiye bin solên wan; soline dûz û vebriqoyî, ji  
solên Xwedê jî mezintir bûbûn.

Jinên vî welatî ziman dirêjin, mixabin, her diçe sîng  
û paşiya wan biçûk dibe zimanê wan dirêjtir dibe.

Dîtina kenê zaroyekî yan nivîsandina çêrokekê; bila  
hezar çêrok bibin qurbana kenê Stêrê. Ew jî mîna wî  
biyan bû; bi hev re zoyekî beravêtî dinimandin. Di de-  
mên çûyî de, di rojên baranê de, ji mal derdiketin, çav

bi baranê tijî dikirin û lêvên miçiqî avdidan. Tiliyên bê nêvên -ji zûde jê re kişandine- têve dide ber lêvên ziwa û tîş-tîşî; çend diran bi tenê di dêv de hêştine.

Ji tirsê ku ew careke din bêvên kişandin, nêvên Diranê Pîrê xwe di bin ayarê wî yê kefnî de veşartine.

Navê wî û dîtina devê wî yê bêvên diran, dihêst ew bibe cihê pêkenî; "Çawa navê teyê Diran be û diran di devê te de tune bin". Digotin û riwê wî bi xweziya ku ji devê wan dipekkî, diwerimandin.

Ew du çivên basik şikestî bûn, per jê qurçimandibûn û mîna du mirîşkên kûntazî hêstibûn.

- "Te çima ez hêstî, tu ji min re baran, qehwa sibê û nêvên pilingan bû. Demê tu di rex min de dîsekinî, min dikarî şerê xwe di kevîran jî bida; ez bi ewir û segan de direwîm". Radihêje piyala çaya mirdar û lekake fireh di dîwarê hemberî wî de çêdibe. Bi şikandina piyalê re, hinekî laş sar dibe, xwe davêje ser têt; bihna porê Stêrê û baranê jê diherike, mîna segekî polîsan bêvên xwe fireh dike û di ser nivînê re digere.

- "Te çima ez hêstî û tu çû, tu ji min re dê û dêv bû".

Welatê ku mêraniya xwe li ser seriyên cemawerê xwe bibîne û şûşeyan di paşiya rewşenbêrên xwe de biçîne, helbet dê welatê tozê be; baran dê jê bireve û ji bilî zayîna mirîşkan dê tu tişt lê tunebe.

Diranê Pîrê di lêpîrsîna ku pêre çêkirine de aşkere

got: "Ez ji we ditirsim, di dinyê de tirsana min ji we tenê heye, ne ..... .. , ne jî ji dêwên ku di devên kaniyan de rûniştine. Ez baş dizanim ku hûn karin bihêlin ku ker ji nijada xwe dagere û bêje ez kevroşk im. Ez ne li gorî hilkişandina nêwêk û dirana me û ji bizavên têxistina şûşeyan jî bitirs im. Hûn çî bixwazin bila bi ya we be û kî dibêje mast ne reş e bila bê vir. Navê min jî dixînin bin konê kîjan partiyê bila bi ya we be, çend salan min davêjin zindanan ne xeme, bes min dûtî bizavên şûşeyan têvedin".

Bergerên wî bê guhdan man û heya roja îro, tevî çend sal û bijîşk di ser kişandina nêwêkan re derbasbûne jî, ew di bin eyarê kefnîkî de veşartî mane û naxwazin derkevin.

- "Stêr, te çima ez bi tenê û rût di vê beyabana ziwa de hêştim, tu leylana kaniyekê bû di beyara jiyana min de". Ew ji ser têxt radibe û careke din di qurzîka perda qetiya re li cadê dinêre ku hîne ew kes di cihê xwe de sekiniye. "Ev kî ye û çî ji min dixweze". Dema ew ji piş perdê vedigere û li ser têxt rûdine, ji xwe dipirse.

Bûbû çend salên wî ku reviyê vî bajarî û odeyek di banê dîkanekê de kirêkirî, kesên qatên jor tucarî ew nedîtine, mîna mişkan bi dizî û di bin perdeyên şevê de ji odeya xwe bi derdiket da ku sendewîşekî an jî pakêtekê ji dikana di bin de bikiriya.

Di wê kêlîka ku, çav bi pirtûka wî dikevin, ber bi wê quncî ve diçe û radihêje wê, gava wêneyê nivîskêr li aliyê din dibîne, dêv tijî dike û goleke tufiyê di eniya wî de derdike.

- "Giş bi sedema te bû; Te hêşt ku diran û nênûkên min bèn kişandin. Bila tu zanibî ku şûşe çidikin; çawa raman û baweriyên ji mêjiyên yekî hildikin. Te ji bona gewdê xwe û hembêza pîrekekê hêştibû bi sedan ên wekî min bê diran û nênûk bimînin". Ew bi cildê pirtûkê digre û diqetîne; weşandina pelan odê mişt dike û yeko-yeko di bin nigên xwe de dişkîne, wêne û çêrokên wî dipelixîn e.

Di demên wilo de, Stêrê kela wî dirjand; bi seriyê wî digirt û dixist nav zoyê memikan, bihna binefşan ew sersend dikir û heya bi demekê bê deng dima û ji tirsê û ta ku, wan bi hilma xwe nekizirîne, wî heya bi demeke dîtir bihna xwe digirt.

- "Te çima ez hêştim û tu çû, Stêr. Ez ne yê ku, li hemberî leşkerên Sargon şer bikim. Tu ji min re "Bozê Rewan" bû; ez dûr direvîm".

Ew radihêje pelekî şikestî û dixwîne; "Di rojêke weke îro de, Xwedê ferîştên xwe dişîne ezmanê welêt û ew diyariyên wî bi ser zarokên welêt de dibarînin û bi vekirina devên qutiyên diyariyan re, bombeyên Xwedê di laşê wan de diteqin, seriyên jêkirî hîne devliken in û



cobarên xwînê.. ên, dîrokê ziwa nabin". Bi pelê şikestî digre û davêje hundir xalîdankê; "Bese, te ez daqurdime, ez pelekî payizê bûm û bi bê re difirîm, ew kuva biherikiya ez pêre diçûm, çima tuyê min di riwê bê de biçînî. Di welatê tozê û ewrên stewir de, kê gote te ezê şîn bibim". Di kêlîka ku dike êrîşî wêneyê nivîskêr bike, ew ji cildê pirtûkê hildikşe û li şûna pirtûka xwe rûdine. Evê yekê hêşt ku hêrsê wî zêde bibe û dît ku ev yeka keyseke wî ye da ku hemû tolên xwe jê vede; erîşî wî dike.

Reqiniya serî û cobarên ku di eniyê de derdibin digên hev. Destên xwe li stûyê wî dide hev lê tiliyên wî di nav hev re derbas dibin.

- Min zanîbû tu leylan î; derewî û gotinên te jî derewên leylana te ne. Tê bîra wî ku çiqas şev di odayên qeşagirtî ku bihna kefnikê ji koşeyan difûrî, di nav nivînên bi ken, hêsir û dilopên mîzê de, raman û çêrokên wî dicûtin. Pir caran pirtûk li eniya wî diket, ji xew şiyar dibû û careke din ramanên wî dicûtin.

Milet bi cûtina bînîşt û xwarina dendikan mijûl e da ku bighên armancên xwe di avakirina welatekî aza de û durûşma wan a yekem: Ji her welatperwerekî re tûrik dendik û qutiyeke benîşt.

- Te xêre û tu çima girî şûn de didî, ji hêsrên xwe ditirsî. Ez ne dêw bûm. Tê bîra te ku tu li ser milên min

mezin bû û du baskên bazan bi milên te ketin. De rabe ez eniya te dermankim, bese tu wî serî li dîwaran didî, te tu dîwarên welêt nehêştine ku, bi lekên xwînê riswa nekirine.

Sîtila ava qeşagirtî, dihêle laşê ji hevketî di qurzîka oda lêpîrsînê de kom ser hev bibe. "Min sare. Çivîkên di nav berfê de, bûn komir.. Baran dereng mayî, hinek av bidin min". Bi pana ku di nîvê newqa wî de diteqe hêşrek ji çavên D. Pîrê dirje û dengê wî tê birîn.

- Ev bênamûsa çima nabêje ax?! Qey, lawê dêlan, te zimanê xwe di binê diya xwe de ji bîr kirî. Rahêjin wî û bibin odeya firandinê, bila qîr-qîrên wî guhên Xwedê qul bikin. Serok, bi hêrs, deng li berdevkên xwe dike û bi hêrseke tûjtir, lingê rastê hildide jor û bi ser tiliyên destê Dirên ê rastê de tîne xwar; hestiyên sipî di çermê sê tiliyên wî re davêjin.

Du berdevik bi porê D. Pîrê digrin û li dû xwe dikşînin. Ezmanekî sor bi laşên çivîkan hatiye mêxkirin. Riyeke dirêj, kanîne qîr û tozê di herdu rexên rê de vedibin, çavên reng-rengî jê diherikin, mirovine stûqelaz bi dîwarên ku, di dirêjiya rê de .. daleqandîne. Kelemêşên zer ji alastina kovanan têrbûne û bi dilsarî li dor devê wan dizîvirin.

- Çi gunehên wî hene. Berdevkê oda firandinê dipirse.

- Rojnamevan e. Ew, bi sîngê pîrekan û welêt dilîze. Ev